# Bersûc hat berdan lê bêsûc 22 sal in girtî ye

*DI 7'Ê KANÛNA* 2018'an de, di danişîna biryardayînê ya 'Doza Licê' de Dadgeha Cezayê Giran a 1'emîn a Îzmîrê biryar da. Heyeta dadgehê ji ber ku bersûcê Fermandar Tûnay Yanardag miriye biryar da ku Yanardag ji dosyayê bê derxistin û der barê bersûc Fermandarê Cendirmeyan ê wê demê Eşref Hatîpoglû de jî biryara beraetê da.



*WELATIYÊ* bi navê Mehmet Emîn Ozkan, di 22'yê cotmeha 1993'yan de li Licê ya Amedê bi hinceta ku 'Fermandarê Cendirmeyan Bahtiyar Aydin kuştiye' cezayê muebeta giran lê hat birîn û hat girtin. Tişta sosret ew e ku bersûcê dozê fermandar Eşref Hatîpoglû beraet kir lê welatî Mehmet Emîn Ozkan 22 sal in ji ber heman dozê girtiye û serbest nayê berdan... RÛPEL - 3

## Stêrkeke geş ji ezmanê hizra neteweyî rijiya



*KONSEYA* Rêveber a KNK'ê bi boneya wefata profesor, nivîskar, zimannas û rewşenbîrê kurd û Kurdistanê Cemal Nebez peyameke sersaxiyê weşand. KNK'ê diyar kir ku stêrkeke geş ji ezmanê hizra neteweyî rijiya.

# e-rojname

10 Kanûn - Duşem 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 200

## Şerxwazî û aştîxwazî



Bi girtina Sirri Sureya Onder û cezakirina Demîrtaş û Baluken peyamek girîng ji hêla dewletê ve hat dayîn. Wan peyama; 'Qet hêviya çareseriyê û muzekereyan nekin' da û qasidên aştiyê jî avêtin zindanê. Gelê kurd bi sed salan in ku di şert û mercên şer de dijî. Bi taybetî jî di 35 salên dawî de kurdan şahîdî ji şerekî nedîtî yê ku mînakên wî li dinyayê kêm tên dîtin kir... *Nivîsa Tayîp Temel / R.3*

# KARNEYA ZILMÊ

## Hefteya Mafên Mirovan îro dest pê dike. AKP ji sala 2002'yan vir ve îktîdar e û ji wê demê heta niha 47 hezar 910 caran mafê jiyanê hatiye binpêkirin

### 47 HEZAR BINPÊKIRIN

Parlamenterê CHP'ê yê Stenbolê Sezgîn Tanrikûlû binpêkirinên di 16 salên îktîdara AKP'ê de rû dan bi navê "Karneya Binpêkirinên Mafan a îktîdara AKP'ê" kir rapor. Li gorî rapora Tanirkûlû di 16 salan de 47 hezar û 910 caran 'mafê jiyanê' hatiye binpêkirin. Daneyên der barê çalakiyên Geziyê yên 2013'an daxilî vê raporê nehatine kirin.



### KUŞTIN, GIRTIN, ÎŞKENCE

Di raporê de hat diyarkirin ku di 16 salên dawî de jî 14 hezar û 960 jin ji aliyê zilaman ve hatine kuştin. Li gorî raporê di navbera 2011-2018'an de mafên jiyanê yên 4 hezar û 3 zarokî hatine binpêkirin. Li gorî raporê 21 hezar û 325 kes bi işkence û muameleyên nebaş re rû bi rû mane û herî kêm 591 rojnamevan hatine girtin... RÛPEL - 3




## Êlek Zer bi biryar in

Çalakiya Êlek Zeran a li Fransayê berdewam dike. Li gorî agahiyên dawî di çalakiya Êlek Zeran de 1385 kes ketin ber lêpirsînê û tenê li Parîsê 974 kes hatin binçavkirin. Li herêma Occîtanîe ya li başûrê Fransayê, li bajarê Toûloûseyê şerekî giran rû da... RÛPEL - 4



## Zebîhî hat oxirkirin

Her du birayên bi navê Rehîm û Keywan Zebîhî ji bo fîlmekê li ser kolberan çêbikin çûbûn bajarê Baneyê yê rojhilatê Kurdistanê, lê ji hêla kesên ne diyar ve hatibûn kuştin. Her du bira bi tevlêbûna gelek hunermendan bi merasîmeke girseyî hatin oxirkirin.



## Seta Folklora Kovaran

Weşanên Wardozê bi navê "Seta Folklora Kovaran" hemû nivîsên folklorîk ên kovara Hawar, Ronahî û Roja Nûyê tesnîf û çap kirin. Set jî sê pirtûkan pêk tê. Weşanxaneya Wardozê bi vê setê şewqek li folklora kurdî zêde kir... RÛPEL - 6





## Li dijî zilmê berxwedan

Hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk têkildarî tecrîdê û greva birçîbûnê axivî û diyar kir ku dîroka zilmê hebe dîroka berxwedanê jî heye û wiha got: "Dîroka me dîroka berxwedanê ye. Kurdan hemû destkeftiyên xwe bi berxwedanê bi dest xistine."... RÛPEL - 3

## Piştgirî mezin dibe

Hevseroka KCD'ê Leyla Guven ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin 33 roj in di greva birçîbûnê de ye. Li gelek girtîgehan, li Kurdistan û Ewropayê çalakiyên grevê dewam dikin. Li Amedê jî endamên KCD, TJA, DBP û HDP'ê dê dest bi greva birçîbûnê bikin... R - 3



## Çalakîya wijdanî vila bena!

Ewro seba ke na bêhiqûqî orte ra bêra wedarnayîş çalakîyî estî. Demêko derg o ke nê çalakîyî dewam kenî. Labelê çalakîya en peyêne ya ke hema... *Nûşteyê U. Serhildan Andan / R - 5*

# Ganî CPT cade bikewo dewre

Tecrîdo girankerde ke Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî ser o yeno domnayene, dewam keno. Avûkatê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî Îbrahîm Bîlmezî tecrîdî rê hêrsê xo ard ziwan û va: "Ganî sere de CPT û sewbîna dezgeyê Ewropa seba Îmrali cade bikewî dewre. Meseleyê kurdî de muxatabê dewleta tirkî Ocalan o. Qerarê MHMEyî sîyasî yo."... RÛPEL - 5



www.arsivakurdi.org



## Li Siûdiyê jin êdî dikarin di wezareta dadê de bixebitin

**RIYAD -** Cara yekemîn di dîroka Erebistana Siûdî de jin wek karmend di Wezareta Dadê ya Siûdiyê de kar dikin. Rojnameya Ekaz a Siûdiyê ragihand ku piştî hate aşkerakirin ku jin jî dikarin di Wezareta Dadê ya Erebistana Siûdî de kar bikin, karmendên jin di pênc beşan de dest bi kar kir. Jinan beriya demekê bernameya amadekirinê ku rêveberiya jinan amade kiribû, bi dawî kir da ku pêşxistina wezaretê di gelek aliyan de pêk bînin. Li gorî rojnameya Ekazê, karmendên jin dê di dadgeh, nivîsên dadgehê, pêşwazîkirin, rêveberî, rêveberiya bangewaziyê, komîteyên lihevanînê û rêberiya malbatan de cih bigirin.

# Jin zîhniyeta zayendperest diguherînin

Mala Jinan a kantona Girê Spî ji bo perwerdekirina jinan û çareserkirina dozên jinan bê navber dixebite. Li gorî rêveberan di demên dawîn de hejmara pirsgirêkên ku têne navendê kêm bûye. Ev jî bi saya rê û rêbazên çareserkirina pirsgirêkan û perwedekirina jinan û civakê pêka hatiye



Çeteyên DAIŞ'ê dema ku kantona Girê Spî dagir kiribû, hemû saziyên girêdayî jinan qedexe kiribûn, her wiha jin di civakê de bê par hiştibûn. Piştî ku kanton ji aliyê şervanên YPG û YPJ'ê ve hatie rizgarkirin, jinan ji nû ve xwe bi rêxistin kir, komunn û meclisên xwe ava kirin. Heya niha 35 komun û meclisên jinan hatine avakirin. Jinên kantonê her wiha saziyên xwe yên xweser vekirin ku karibin jinan perwerde bikin û pirsgirêkên wan çareser bikin. Yek ji van saziyan jî Mala Jinan bû.

Di destpêka vekirina Mala Jinan de hema bêje mehê 50 pirsgirêk radestî Mala Jinan dihatin kirin, piraniya wan girêdayî zewicandina di temenê biçûk de bûn. Endamên Mala Jinan ji bo çareserkirina pirsgirêkan xebateke bênavber pêk tîne. Li gorî endamên Mala Jinan di demên dawî de hejmara pirsgirêkên tên gel wan, kêm bûne niha mehane zêdetirî 20 pirsgirêk tên û ew jî bi rêgezên edaleta civakî tên çareserkirin.

Rêvebera Mala Jinan a kantona Girê Spî Fadiya Şerîf Xelîl li ser mijarê wiha tîne ziman: "Heta niha li gund û bajarokên kantonê me 35 komun ava kirin, her komunek civînên xwe yên asayî li dar dixe. Me karî roleke erênî di perwerdekirina jinan û pênasekirina rola wan de bilîzin." Fadiya Şerîf destnîşan kir ku piraniya pirsgirêkên ku tên gel wan, girêdayî zewicandina di temenê biçûk de ne û pirkirina hevjînan e û da zanîn ku piraniya pirsgirêkan bi rêgeza edaleta civakî hatin çareserkirin. Fadiya Şerîf Xelîl di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Wek Mala Jinan em mafên jinan diparêzin û wan perwerde dikin da ku rola xwe di civakê de pêk bînin." *GIRÊ SPÎ*

## Doza Nisêbînê bê alî nayê lêkolînkirin

Di qedexeya derketina derve ya Nisêbînê de di 26'ê gulana 2016'an de 53 kesên hatibûn tehliyekirin hatin girtin. 5'emîn runiştina dozê wê îro were dîtin. Girtiyên ji aliyê 4'emîn Dadgeha Cezaya Giran a Mêrdînê ve li salona Konferansa Midûriyeta SGK'ê tên darizandin bi 76 caran cezayê muebeta giran tên darizandin. Nûrşan Demîr a di qedexê de li mala xwe ya li taxa Firatê bû û piştî tehliyekirinê hat girtin dayika 5 zarokan e. Nûrşan ya li girtîgeha Tîpa T ya Wanê dimîne beriya rûniştinê nameyek ji JINNEWS'ê re şand.

Nûrşanê di nameya xwe de wiha got: "Ez dayikek im. 3 sal e di girtîgehê de me. Di şexsê min de zarokên min tên darizandin. Jiyana perwerdeya wan qedya. Gelek pirsgirêkên derûnî bi wan re çêbûne. Girtina min têr nekir ez şandim bajarekî din. Şansê dîtina zarokên min kêm bû. Ji ber rewşa aborî zarokên min nikarin bên. Bavê wan li bajarekî din dixebite. Ev ji bo tehliyekirina min hincetên şênber in. Di dosyayê de der barê şexsê min de tu delîlek şênber tune ye.

**Tenê li mala xwe xwedî derketim**

Îfadeyên kesên bê wijdan hene. Ger hinek bi wijdan tevbigerin wê bizanibin ez di çi şertan de li wir mame. Min dixwest ku heyet vê dosyayê bê alî binirxîne. Pevçûn ne li çolterê li taxa me pêk hat. Ez tenê xwedî li mala xwe derketim. Ji van pêkanînan malbata min zirara mezin dît. Ez hatim girtin. Malbata min carna bi mehan nikare bê hevdîtina min. Ger darizandinek adilane bê kirin ez ê bêm berdan.

**Tenê carekê îfade hat girtin**

Îro dadgiha min heye bawer im ez dîsa tev li nebim. Tenê carekê îfadeya min hat girtin. Piştre hatim sirgûkirin. Ez dixwazim tev li rûniştinê bibim û darizandinek adilane pêk bê."
*MÊRDÎN*



## Pêşîlêgirtina tundiyê bi perwerdeyê pêkan e

Li Hola Rewşenbîrî ya Silêmaniyê di çarçoveya pêngava têkoşîna li dijî tundiya li hemberî jinan de, ji aliyê wezareta rewşenbîrî û ciwanan ve bi hevkariya Rêveberiya Huner û Rewşenbirî ya Silêmaniyê ve semînerek ji bo karmendên rewşenbîrî û hunerî hate dayîn.



Semîner ji aliyê mamostaya zanîngehê Xuşî Letîf ve hat pêşkêşkirin. Letîf di semînerê de aşkera kir ku her nêzîkatiyek xerab cureyeke tundiyê ye û got; "Tundiya li hemberî jinan jî zêde bûye û wekî diyardeyek lê hatiye. Ji bo pêşîlêgirtina tundiyê divê kar li ser zagonan were kirin. Kesên ku tundiyê dikin werin cezakirin."

Xuşî Letîf di dewama axaftina xwe de bal kişand ser girîngiya perwerdeya civakî û wiha domand:" Ji bo pêşîlêgirtina tundiyê rolek girîng dikeve ser milê perwerdeyê. Daxwaz ji hunermendan dikin ku di karê xwe yê hunerî de zêdetir girîngî bidin mijara perwerdeyê." *SILÊMANÎ*

## Jin kevneşopiya **'kade'**yê didomînin

Kevneşopiya 'kade' ku bi navê kulîçeya kurd tê zanîn û di tenûrê de tê pijandin, ji aliyê jinan ve tê berdewamkirin. Leyla Peyan ya bi salan e kade dipijîne, diyar kir ku tehma kadeyê ji ardên biraştî û gûzan tê.

Kade li gelek bajarên Kurdistanê tê çêkirin û bi salan e wek kevneşopî nifş bi nifş heta îro hatiye. Yek ji kesên ku vê kevneşopiyê didomîne, Leyla û keça wê Meryem Peyam a li Sixkê ya Wanê dijîn e.

Leyla diyar dike ku di temenê biçûkatiyê de çêkirina kade ji dayika xwe hîn kiriye û wiha got: "Ewil em hevîr dikin. Tirş dibe û em piştre dibin li tenûrê dixin. Meryem jî hundirê kadeyê çêdike. Em ardê biraştî û gûzan dikin navê. Em şekir an jî xwê jî dikinê. Ji ber zivistanê em zêde çêdikin û davêjin cemedankê."

Leylayê di dawiya axaftina xwe de da xuyakirin ku çêkirina kadeyê gelek bi zehmet e û got ger hevîrê wê baş çênebe bi tenûrê ve jî nagire û divê rûnê hevîr baş bê pîvan. *WAN*





## Têkoşîna jinek û berxwedana Şêxmeqsûdê


Nisrîn Cefo dayika 6 zarokan e û temenê wê 41 sal e. Piştî ku xwendin berda, ji dayika xwe fêrî dirûnkariyê bû. Nisrînê rêya xwe tenê berdewam kir û cilên cuda, dodel û ji tevahî temenan re li sûkan bala wê dikişandin lê nikarî hin cil bidirûtina û diçû ji sûkê dikirîn û ji nû ve çêdikirin ji bo ku fêr bibe.


Bi domana demê re heweskariya Nisrînê bi pêş ket û ji şêniyên taxê û xizman re tevahî modelên folklorîk û cilên zarokan dirûtin. Di dema şerê Şêxmeqsûdê de Nisrîn ranawesta, berevajî hîn zêde bû û alîkariya şêniyan kir ku li ser axa xwe bimînin û ji ber şer û ambargoya li ser taxê şêniyan nikarî cil ji zarokên xwe bikiriyana û berê xwe dan Nisrînê, ji bo sererastkirin û çêkirina cilan bi bihayeke hindik an jî bê pere.


Her wiha dirûtina cilên jinên ku ji bo amadekirina xwarina şervanan di çeperên şer de dixebitin, girt ser xwe û ji wan re didirûtin. Ji ber pisporiya Nisrînê di dirûtina cilên folklorîk de bû sedem ku cilên komên govendê bidirû. Her wiha Nisrînê destnîşan dike ku piştgiriya dayika wê ji bo dirûtinê hişt ew di vî pîşeyî de bibe pispor. *HELEB*

## Li Kelarê pêşangeha karên rengin









**Komek jinên ciwan ên Germiyanê ji bo nîşandana berhemên jinan ên bi destan pêşangehek vekir. Li ber Parka Leyla Qasim a navçeya Kelar a ser bi îdareya Germiyanê komek jinên ciwan ên xwedî huner, bi alîkariya Rêxistina Xelkê û Rêxistina Rewşenbîrî ya Xanzad pêşangehek ya berhemên karê destan vekir. Di pêşangehê de gelek tiştên ji bo raxistina nava malê, ji bo zarok, jinan û gelek tiştên ku rojane pêwîstî pê çêdibe hatin nîşandan. Tiştên ku di pêşangehê de hatin nîşandan hemû ji aliyê koma Jinên destrengîn a Germiyanê ve hatine çêkirin.** *GERMIYAN*

www.arsivakurd.org

# Karneya binpêkirinên mafan ê AKP'ê

Li gorî "Karneya Binpêkirinên Mafan a Îktîdara AKP'ê" di navbera 2002 û 2018'an de 47 hezar û 910 caran "mafê jiyanê" hatiye binpêkirin. Her wiha di 16 salên dawî de 14 hezar û 960 jin hatine qetilkirin û 22 hezar cinayetên kar pêk hatine

Parlamenterê CHP'ê yê Stenbolê Sezgîn Tanrikûlû binpêkirinên di 16 salên îktîdara AKP'ê de rû dan bi navê "Karneya Binpêkirinên Mafan a Îktîdara AKP'ê" kir rapor. Li gorî rapora Tanirkûlû di 16 salan de 47 hezar û 910 caran "mafê jiyanê" hatiye binpêkirin. Daneyên der barê çalakiyên Geziyê yên 2013'an de daxilî vê raporê nehatine kirin.

Di raporê de hat diyarkirin ku di 10 mehên ewil ên sala 2018'an de 363 jin ji aliyê zilaman ve hatine kuştin û di 16 salên dawî de jî 14 hezar û 960 jin ji aliyê zilaman ve hatine kuştin. Di raporê de hat diyarkirin ku di sala 2018'an de ji ber koçberiyê 83 kes mirine û di 16 salên îktîdara AKP'ê de jî 58 kes bi "cinayeta nefretê" hatine kuştin.



**Mafên 4 hezar zarokî binpê kirine**

Li gorî raporê di navbera 2011 û 2018'an de mafên jiyanê yên 4 hezar û 3 zarokî hatine binpêkirin. Her wiha di raporê de hat diyarkirin ku di sala 2018'an de hezar û 797 û di navbera 2002 û 2018'an de jî herî kêm 22 hezar û 224 kes bûne qurbanên cinayetên kar.

Di raporê de hatiye destnîşankirin ku di navbera 2008 û 2018'an de 357 kes li leşkeriyê bi awayekî "guman" mirine. Îstatîstîkên binpêkirinên mafan ên di dema hewldana darbeyê ya 15'ê Tîrmehê de jî tê de cih girtin. Li gorî raporê 179 sivîl, 62 polîs û 29 leşker û bi giştî 270 kes mirine û 2 hezar û 195 kes jî birîndar bûne.

**Bi hezaran kes hatine îşkencekirin**

Li gorî raporê di navbera 2002 û 2018'an de 21 hezar û 325 kes bi îşkence û muameleyên nebaş re rû bi rû mane. Ji vana 2 hezar û 14 kes di sala 2018'an de bi îşkence û muameleya nebaş re rû bi rû mane. Li gorî raporê di navbera 2002 û 2018'an de herî kêm 591 rojnamevan hatin girtin. Hetanî daneyên 30'yê mijdara 2018'an; 175 rojnamevan girtî ne.

Li gorî rapora Tanrikûlû piştî hewldana darbeyê ya 15'ê Tîrmehê heta Tîrmeha 2018'an ji 177 zanîngehan 6 hezar û 81 akademîsyen hatine îxrackirin. Ji kesên hatine îxrackirin nêzî 400 heb jê akademîsyenên îmze danîne bin danezana aştiyê. Li gorî vê raporê ji ber vê danezanê der barê nêzî 200 akademîsyenî de doz hat vekirin û 21 akademîsyen jî hatin cezakirin.

Li gorî raporê di navbera 2012 û 2017'an de 16 hezar û 28 kes întihar kirine. Li gorî raporê piştî îlankirina Rewşa Awarte heta sala 2017'an 49 saziyên tenduristiyê yên taybet, 2 hezar û 271 sazî û dezgehên perwerdehiyê yên taybet, hezar û 427 komele û 15 weqf û 19 sendîka bi KHK'an hatine girtin. ***ENQERE***

## HDP grevê dibe desteya giştî ya meclisê

Çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger a Hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven ku ji bo rakirina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daye destpêkirin di roja 33'yan de didome. Her wiha heman çalakiya girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê yên li girtîgehên bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê girtîne jî kete roja 14'yan û komên duyemîn çalakiyan dewr girtin. Piştiriya ji bo van çalakiyan hem li Kurdistanê û hem jî li qada navneteweyî her ku diçe zêdetir dibe û bi sedan kes bi heman daxwazê di greva birçîbûnê de ne.

Di vê çarçoveyê de HDP çalakiya greva birçîbûnê ya Guven dê bibe desteya giştî ya meclisê ku dê îro hevdîtinên budceya 2019'an dest pê bikin. Desteya Rêvebir a Navendî ya HDP'ê di civîna xwe ya 6'ê kanûnê de ji bo çalakiya greva birçîbûnê ya Guven biryara plansaziyên nû wergirt. Dê HDP di nav koordînasyona ku li Amedê ji bo çalakiya Guven hat çêkirin de û bi awayekî çalak di nav çalakiyên bên lidarxistin de cih bigire. Li gorî çavkaniyên HDP'ê dê der barê çalakiya Guven de li tevahiya Tirkiyeyê çalakiyên deng û tefandina ronahiyan bê destpêkirin.

Îro li desteya giştî ya meclisê der barê qanûna budçeyê de axaftin bên kirin. Dê koma HDP'ê di axaftina xwe de bal bikişîne ser rewşa Guven. Kadroya HDP'ê dê bi tevahî tev li hevdîtinan bibe û mijara sereke jî greva birçîbûnê ya Guven be. Her wiha HDP hewl bide bi daxwaza edaletê li Amed û Stenbolê ji bo lidarxistina mîtîngan bixebite. ***ENQERE***

## Dîroka berxwedana kurdan jî heye

**Mehmet Şah ORÛÇ - Ozgur PAKSOY / AMED - MA**

Hevserokê KCD'ê û Parlamenterê HDP'ê yê Agiriyê Berdan Ozturk tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û çalakiyên greva birçîbûnê yên di şexsê hevserokê KCD'ê Leyla Guven de hatin destpêkirin nirxand. Ozturk diyar kir ku tecrîda li ser Ocalan li dijî hiqûqa navneteweyî ye û wiha got: "Çi dibe bila bibe bi tu awayî tecrîd nayê qebûl kirin. Birêz Ocalan çi dema biaxive, dengê wî yê ji bo aştî, demokrasî û azadiyê bilind dibe, rewşa heyî diguhere. Lê ji bo ku civak vî dengî nebihîse, tecrîdê girantir dikin. Armanc dikin gel û birêz Ocalan ji hev qut bikin."



Ozturk da zanîn ku bi kûrkirina tecrîdê re dixwazin peyama 'Em ê we tune bikin, em ê we di jenosîdê re derbas bikin û em ê vîna we serobin bikin' bidin gelê kurd û ev tişt anîn ziman: "Dîroka me dîroka berxwedanê ye. Kurdan hemû destkeftiyên xwe bi berxwedanê bi dest xistine. Heya niha tu kesî bi xêra xwe tu maf nedane gelê kurd. Hemû êrîşên xwe li ser kurdan ceribandin. Bajarên wan serobin kirin û bi hezaran kurd girtin. Gelo bi ser ketin? Na. Ger hîna em li vir in, wê demê ew qet bi ser neketin. Ger dîrokeke wan a zilmê hebe, a me jî dîroka me ya berxwedanê heye."

Ozturk behsa girîngiya çalakiya greva birçîbûnê ya Leyla Guven jî kir û bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: "Pêkanînên hovane yên Esat Oktay bi berxwedanê têk çûn. Ji bo pêvajoya şer bi dawî bibe birêz Guven dest bi çalakiya greva birçîbûnê kir. Daxwazên Guvenê daxwzên me ne jî. Girtiyên siyasî û HDP'î hemû xwedî li daxwaz û çalakiya Guvenê derdikevin. Çalakiya Guvenê da destpêkirin, çalakiyeke wijdanî ye û divê hemû beşên civakê yên xwedî wijdan xwedi li vê çalakiyê derbikevin. Ancax bi vî awayî wê ev çalakî bi encam bibe."

## Pêwîstî bi zêdekirina zextên navneteweyî heye

Piştgiriya ji bo daxwaza Leyla Guven a rakirina tecrîdê li qada navneteweyî jî zêde dibe. Di vê çarçoveyê de Parlamentera Partiya Çep a Swêdê Amîneh Kakabaveh li ser tecrîdkirina Ocalan û grevên birçîbûnê ji ANF'ê re axivî. Kakabaveh di destpêka axaftina xwe de bi bîr xist ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi rengekî giran hatiye tecrîdkirin û wiha got: "Eger Tirkiye dixwaze li cîhanê bi başî qala wê bê kirin, divê tavilê hurmetê nîşanî mafên bingehîn ên Ocalan û girtiyên din ên siyasî bide. Ya ku li Tirkiyeyê tê kirin, zalimane û hovane ye."

Kakabaveh destnîşan kir ku dîrokê nîşan daye ku li cihê zext û zilm hebe, berxwedan û têkoşîn jî heye û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ji bo bidawîkirina tecrîdkirina Ocalan pêwistî bi têkoşîneke siyasî heye û divê PKK ji nava lîsteya 'rêxistinên terorê' were derxistin. Ji bo bidawîkirina tecrîdkirina Ocalan divê hîn bêhtir zext li CPT, Yekitiya Ewropa û saziyên navneteweyî were kirin. Kurdistaniyên li welatên rojava ne, ji bo bandorê li hikûmet û parlamenteran bikin divê bikevin nava hewldanan. Heta tecrîdkirina Ocalan bi dawî nebe dê şerê li Tirkiyeyê hîn girantir bibe."

**Tecrîd şermezar kirin**

Li bajarê Torîno yê Îtalyayê her sal bi navê "Na ji şer re" meş tê lidarxistin. Kurdistanî jî tev li meşa îsal bûn û di çalakiyê de tecrîdkirina rêberê xwe Oclan şermezar kirin. Kurdistaniyan di meşê de piştgiriya xwe ji bo çalakiya greva birçûbûnê ya Guven anî ziman. Greva birçîbûnê ya li paytexta Danîmarka Kopenhagenê hatibû destpêkirin jî didome û kete roja xwe ya 3'emîn. Çalakgerên di grevê de ne bang li CPT û saziyên din ên navneteweyî kirin û ji wan daxwaz kirin ku ji bo rakirina tecrîdê bikevin nava liv û tevgerê.

Li aliyê din li bajarê Grazê yê Awûstûryayê jî ji bo şermezarkirina tecrîda li ser Ocalan greva birçîbûnê dest pê kir. Grev li salona Navenda Civaka Demokratîk a Kurd (NCDK) pêk tê û 10 kes tev li bûne. Gelek Kurdistanî û dostên wan ên Awûstûryayî serdana çalakgeran kirin. Komek ji ciwanan a ji Rêxistina Ciwanan a SPO'yê jî peyama piştgiriyê ji bo gelê kurd da. Kurdistaniyên ku ji bo bidawîkirina tecrîdkirina Ocalan li Swîsreyê ketine greva birçîbûnê jî banga mezinkirina berxwedanê kirin û gotin ku ew jiyaneke bê Ocalan tu carî qebûl nakin. ***AMED***



## YPG'ê li Efrînê 4 çete kuştin

Şervanên YPG û YPJ'ê li Efrînê li dijî artêşa tirk a dagirker û komên wê yên çete 3 çalakiyên sabotajê pêk anîn. Navenda Ragihandinê ya YPG'ê têkildarî van çalakiyan daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Navendê ragihand ku hêzên wan di çarçoveya Qonaxa Duyemîn a Berxwedana Serdemê ya Efrînê de li navenda Efrînê û bejahiya navçeyên Cindirês û Bilbilê, li dijî artêşa tirk a dagirker û komên wê yên çete 3 çalakiyên sabotajê pêk anîne. Navendê diyar kir ku di encama çalakiyên hêzê wan de 4 çete hatine kuştin. ***EFRÎN***

**DENG**



Tayîp TEMEL

## Şerxwazî û aştîxwazî

Bi girtina Sirri Sureya Onder û cezakirina Demîrtaş û Baluken peyamek girîng ji hêla dewletê ve hat dayîn. Wan peyama; ***'Qet hêviya çareseriyê û muzekereyan nekin'*** da û qasidên aştiyê jî avêtin zîndanê.

Gelê kurd bi sed salan e ku di şert û mercên şer de dijîn. Bi taybetî jî di 35 salên dawî de kurdan şahidî ji şerekê nedîtî yê ku mînakên wî li dinyayê kêm tên dîtin kirin. Neyarê kurdan qetlîam û jenosîdên hovane li ser wan meşandin. Ji ber vê yekê jî di lûxata kurdan de peyvên wekî ***'ŞER', 'QETLÎAM', 'QIRKIRIN'*** cihekî girîng digirin.

Dibe ku ji ber dijwarî û giraniya şer be di ferhenga kurdan de cihê peyvên ***'AŞTÎ'*** û ***'ÇARESERÎ'*** gelek mezin e. Kurd ji heft salî heta 70 saliyan dema devê xwe vedikin dibêjin; ***'Em aştiyê dixwazin'...*** Di şert û mercên dijwar ên şer de jî û di nava aramiyê de jî daxwaz û doza wan her û her ***'AŞTÎ'*** ye.

Li gorî gelek zanyarên civakî û siyasî ***'AŞTÎ'*** tenê nayê wateya 'rewşa bêşer û aram', her wiha tê wateya nêrîna li jiyanê û pejirandina xwezaya civak û gerdûnê. Heke hêzek an jî kesek xwedî feraset û zîhniyeta serdest û hikûmdariya li ser civak, xweza û derdorê be ne pêkan e ku mirov li wir behsa 'rewşhala aştiyê' bike.

Îro li hemû cîhanê tu peyv bi qasî têgeha ***'AŞTÎ'*** yê nehatiye pîrozkirin û li ser tu gotinên din ev qas stran, helbest û nivîs nehatine nivîsandin. Tevî ev qas eleqe û pîrozkirinê jî mirovahî hîn jî li hemû deverên cîhanê birçî û tîn in bo aştiyê.

Bêguman gelek sedemên vê yekê hene. Lê sedema esasî û girîngtir jî ew e ku her kes wateyeke cuda li gotina ***'AŞTÎ'*** bar dike.

Li gorî hinek zanyar û civaknasan aştî encax piştî jiholêrakirina hest, hiş û rewşa şer bê sazkirin. Ango ew kes û derdor di wê baweriyê de ne ku ***AŞTÎ*** bi tunekirin û jiholêrakirina rewşa dijber dê bê fêhmkirin û peydakirin.

***

Em bên ser mijara kurdan a aştiyê û hêviya çareseriyê...

Rewşeke pir aşkera heye. Li holê dewlet û hikûmeteke ku bi amûr û artêşeke mezin êrîşî kurdan dike heye. Rayedarên vê hikûmeta êrîşkar bi tu awayî behsa aştî û diyalogê nakin û her tim dibêjin 'em ê koka wan biqelînin'.

Li aliyê din jî Tevgera Kurd a di her şert û mercan de behsa girîngiya aştî, diyalog û muzakereyan dike heye.

Gelo di rewşa heyî de divê aştîxwaz û alîgirên çareseriyê bangî kîjan alî bikin? Divê dijberên şer li hemberî kîjan alî rawestin?

Bêguman divê helwest li hemberî aliyê ku şerxwaz bê nîşandan û heta divê ew derdor hemû li kêleka kurdên azadîxwaz û aştîxwaz cihê xwe bigirin.

Lê tiştek zelal heye ku aştîxwaz ji dewleta şerxwaz bêhêvî ne û heta ji ber zextan nikarin bi rehetî helwesta xwe li hemberî wan nîşan bidin. Vêca bi rehetî bang li kurdên di bin xetereya qetlîamê de ne dikin ku ***'aştî û diyalogê'*** esas bigirin.

Êdî zelal e ku heta aştîxwaz û derdorên dijberiya şer dikin li hemberî êrîşên dewletê ranewestin û pêşî li wan negirin, nikarin behsa aştî û diyalogê ji bo aliyê kurd bikin.

Heta li gorî Peymana Medîneyê divê navbeynkar bang li her du aliyan bikin da ku aştiyê pêk bînin, lê kîjan alî qebûl neke divê li hemberî wî alî bikevin nav têkoşîneke çalak.

www.arsivakurdi.org



## Li Ermenistanê hilbijartina pêşwext pêk hat

**ERÎVAN -** Hilbijartina asayî ya Ermenistanê dê di 2022'an de pêk bihata lê piştî aloziya ku rû da hilbijartin bi awayekî pêşwext duh pêk hat. Dengdayîn saet di 08.00'an de dest pê kir û heta saet 16,00'an dewam kir. Di hilbijartinê de 9 partî û 2 bilokên hilbijartinan ketin pêşbirka 101 kursiyên li parlamentoyê. Li gorî zagonên Ermenistanê, her partiyek divê herî kêm ji sedî 5 dengê hilbijêran bigire da ku bikaribe di parlamentoyê de kursiyeke xwe hebe. Lê bilokên hilbijartinan divê ji sedî 7 dengan bigirin. Çavdêr texmîn dikin ku bloka Paşînyan di parlamentoya nû de dengê herî zêde bistîne.

# Li dijî Macron bi biryar in

Çalakiya 'Êlek Zer'an a li Fransayê berdewam dike. Li Fransayê li gorî agahiyên dawî di çalakiya 'Êlek Zer'an de 1385 kes ketin ber lêpirsînê û tenê li Parîsê 974 kes hatin destgîrkirin. Lê çalakvan bi biryar têdikoşin û li ber xwe didin

Li Fransayê çalakiyên 'Êlek Zer'an dewam dikin. Li Fransayê ji 17'ê mijdarê veye bi navê 'Êlek Zer'an çalakî û xwepêşandan dest pê kirine. Çalakvan bi biryar in ku mafên xwe bi dest bixin û dawî li pêkanînên kêfî yên li dijî gelê Fransayê bînin. Di serî de li Parîs, Toûloûse, Saînt-Etîenneyê li gelek bajarên Fransayê çalakî bi tundî derbas bûn. Li gelemperiya welêt di xwepêşandanan de 1385 kes ketin ber lêpirsînê, 974 kes jî hatin destgîrkirin.

Wezareta Karên Hundir a Fransayê ragihand, 10 hezar jê polîs 125 hezar kes tev li çalakiyan bûne. Li gorî çavkaniyên polîsan, di dema çalakiyên 'Êlek Zer'an de gelek wesayît hatin şewitandin, vîtrîn hatin şikandin û ji ber ku bend hatin danîn, êrîş hatin kirin. Tenê li Parîsê 974 kes hatin destgîrkirin.

Li herêma Occîtanîe ya li başûrê Fransayê, li bajarê Toûloûseyê şerekî giran rû da. Bend hatin danîn û kel û pelên înşaetê hatin şewitandin.

Li bajarê Saînt-Etîenne jî wesayîta polîsan hate şewitandin. Li bajarê Rennesê, komeke rûpêçandî li ber qereqola polîsan şewat derxist.

Li Marsîlyayê jî polîsan bi bombeyên gazê, guleyên plastîk û jopan êrîşî çalakiya Êlek Zeran a li ser rêya Vîeûx-Port, Canebîere û Castellaneyê kir. Şer hîn bi dijwarî didome, bajar bûye qada şer.

Hêjayî bi bîrxistinê ye ku çalakger bi biryar in daxwaza mafên xwe dike. Her wiha çalakiya 'Êlek Zer'an a li Fransayê dest pê kir li bajarên Hollanda û Belçîkayê jî belav bû. *PARÎS*





## Amirî: Falih Feyaz namzetê Adil Ebdulmehdî ye


Serokê Hevpeymaniya Fetih Hadî Amirî ragihand ku ji bo wezareta hundirîn Falih Feyaz namzetê Adil Ebdulmehdî ye.

Serokê Hevpeymaniya Fetih Hadî Amirî der barê namzetê Wezareta Hundirîn ya Iraqê Falih Feyaz de nêrîna xwe bi daxuyaniyeke çapemeniyê aşkera kir. Amirî di daxuyaniya xwe de diyar kir ku merciyeta dînî rê daye ku serokwezîr xwe bi xwe namzetên xwe ji bo kabîneya nû ya Iraqê diyar bike û wiha got: "Destpêkê me li ser 14 namzetan bi koma Saîron re li hev kir, ew ên din jî hatin paşvexistin."

Herwiha Amirî di dewama daxuyaniya xwe de qala hikûmetên beriya niha jî kir û ev tişt got: "Hikûmetên beriya niha jî hinek caran deng nedihat dayîn li ser hin wezaretan. Ji ber vê pêwîst e yan destûr bi serokwezîr were dayîn, xwe bixwe kabîneya xwe temam bike, yan jî ji kesekî zêdetir namzet werin nîşandan ji bo wezaretan."

Amirî behsa namzetbûna Falih Feyaz a ji bo wezareta hundirîn kir ku gelek pirsgirêk ji ber namzetbûna wî çêbûn û gelek kes jî diyar dikin li piştî Falih Feyaz Hevpeymaniya Fetih heye, Hadî Amirî wiha got: "Feyaz namzetê Adil Ebdulmehdî ye ji bo wezareta hundirîn, ne namzetê hevpeymaniya Bunya ye. Her wiha em namzetbûna wî ji bo wezareta hundirîn li ser tu aliyek de ferz nakin. Em wan sûcdariyên ji aliyê partiyên din ve li ser namzetbûna wî red dikin."

Ji beriya niha serokê Hevpeymaniya Dewleta Yasa Nûrî Malikî ragihandibû ku Hevpeymaniya wî rê nade ku namzeteke/î din li cihê Felah Feyaz were danîn. Her wiha daxwaz ji Hevpeymaniya Saîron jî kir ku sedema redkirina Feyaz zelal bikin. *BEXDA*



## NY piştevaniya xwe dubare kir

Nûnerê Neteweyên Yekbûyî (NY) yê Iraqê Yan Kobich piştî ku erka wî ya li Iraqê bi dawî bû serdana serokwezîrê Iraqê Adil Ebdulmehdî kir. Ofîsa serokwezîr Iraqê Adil Ebdulmehdî bi daxuyaniyekê aşkera kir nûnerê NY yê Iraqê Kobich serdana wan kiriye û aşkera kir ku Kobich ji ber sedema bidawîbûna erka wî li Iraqê hatiye xatir ji Adil Ebdulmehdî bixwaze.

Hat ezanîn ku Kobich di hevdîtinê de ji Adil Ebdulmehdî ra gotiye ew di wê baweriyê da ye ku dê rewşa Iraqê ber bi başiyê ve here.

Her wiha Ebdulmehdî jî amaje bi wê yekê kiriye bi nemana DAIŞ'ê li Iraqê û bi piştevaniya NY'ê dê Iraq aram bibe û rewşa wê gelekî baş bibe.


Yan Kobich jî piştevaniya NY'ê careke din ji bo Ebdulmehdî aniye ziman û aşkera kiriye ku ew hêvîdar in ku Iraqê ji vê rewşê xelas dibe û dê her tim piştevanê başiya Iraq û xelkê Iraqê bin. *BEXDA*

## *Dunford:* HSD'ê terorîst têk birin

Rojnameya Washington Postê hevpeyvînek bi general û serokê artêşê yê hevbeş Joseph Dunford re der barê gelek dozên girîng û cîwazbûna leşkerî ya Amerîka û pêşbaziya hişk a di navbera wê û Rûsyayê de pêk anî. Di hevdîtinê de behsa rûdana deryayî ya dawîn di navbera Rûsya û Ûkraynayê de û hebûna leşkerî ya Amerîkayê li Afganistanê û hevkariya wê bi Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) re di şerê li dijî DAIŞ'ê li Sûriyeyê de hat kirin.

Girêdayî gefên ji aliyê Rûsyayê ve û bi taybetî piştî ku Rûsyayê dest danî ser keştiyên Ûkraynayê li hemberî berava nîvgirava Qirimê, Dunford got ku tişta ku di deryaya Azovê de rû daye, heta asteke bilind wek helwesta Moskovê li Gurcistanê, nîvgirava Qirim û Donbas a Ûkraynayê ye. Dunford piştrast kir ku Rûsya bi ev helwestên xwe yên "dijminane" cîhanê ber bi şerekî vekirî ve dibe û wiha got: "Tişta ku rûs pêk tînin, ezmûneke civaka navneteweyî ya pêkanîna pîvanan e."

Li ser pirsa ku hêzên Amerîkayê heta kengî dê li Afganistanê de bimînin, Dunford wiha got: "Divê Amerîka di Afganistanê de bimîne" û got şer li Afganistanê bi salan li ber xwe da û tevliheviyek li herêmê çêkir û wiha domand: "Ez dixwazim em dev ji Afganistanê bernedin, ji ber ku dibe ku bêaramiyê li başûrê Asyayê çêbike û derfetê ji komên terorîst re peyda bike ku li vê qadê xwe bi rêxistin bikin û çalakiyên li dijî gelê Amerîkayê plan bikin."



### Destkeftin giranbiha ye

Dunford behsa pêşeroja Sûriyeyê û hebûna hêzên Amerîkayê tê de kir û xwe spart armanca sereke ya têkşikandina DAIŞ'ê û alîkariya bi wezîrê karên derve yê Amerîkayê Mike Pompeo di xebatên dîplomasiyê de da ku çareseriyekê ji aloziya Sûriyeyê re were peydakirin û aram bibe. Li ser pirsa dema mayîna hêzên Amerîkayê di Sûriyeyê de Dunford ev tişt anî ziman: "Em li ser nefikirîne. Hevkarên me yên HSD'ê di Sûriyeyê de destkeftiyeke mezin li dijî DAIŞ'ê bi dest xist û ev yek tiştekî giranbiha ye. Lê der barê peydakirina aramiyê de hê jî rêya li pêşiya me dirêj e û ez ê niha asta karê tê xwestin ji te re diyar bikim."

Dunford wiha domand: "Divê 35 heta 40 hezar leşkerên hêzên herêmî bêne perwerdekirin da ku karibin aramiyê pêk bînin. Heta niha ji sedî 20 ji van hêzan hatine perwerdekirin. Em van hêzan perwerde dikin û hêza wan a şer xurt dikin, tevî ku di şer de leheng in em dixwazin hêza wan baştir be. Aşkera ye ev hêza şerker HSD ji hemû pêkhateyên Sûriyeyê hatiye avakirin û hêza tekane ye ku karibû rêxistina DAIŞ'ê ya terorîst li Rojhilata Navîn têk bibe." Girêdayî mijara pêkanîna aramiyê di Sûriyê de Dunford axaftina xwe wiha domand: "Hê jî rêya li pêşiya me dirêj e". Dunford got dê alîkariya xebatên dîplomatîk ên Pompeo yên salên çareserkirina "şerê navxweyî yê Sûriyeyê bikin" û wiha li axaftina xwe zêde kir: "Ev sedem e û ez nikarim guman bikim ku heta kengî hêzên me dê li Sûriyê bimînin." *WAŞHÎNTON*

## Li Îranê xwepêşandan didomin

Weke rojên borî îro jî xwendekaran li ber Zanîngeha Tehranê dest bi xwepêşandanê kir. Hêzên Îranê dor li çalakiya wan girt. Tevî astengiyan jî xwendekar xwepêşandana xwe berdewam dikin.



Xwepêşandan ji aliyê xwendekarên Zanîngeha Tehran û Zanîngeha Muderîs a Tewrêz û çend bajarên din ên Îranê ve bi dirûşma piştgirîdayîna karkeran berdewam dikin. Xwendekar daxwaza mafê azadiya xweîradekirinê û azadiya siyasetê dikin. Her wiha piştgiriya xwepêşandanên karkerên Îranê dikin.

Di Roja Xwendekarên Îranê de, Xwendekarê Koleja Dermansazî, aktîvîstê karkerî û Endamê Desteya Nivîskarên Kovara Gam Esel Mihemedî li mala xwe ji aliyê hêzên Îranê ve hate binçavkirin. Her wiha tê gotin ku li bajarên cuda yên Iranê hinek xwendekarên din jî hatine binçavkirin.

Her wiha di torên civakî de, tê gotin ku li ber deriyê Zanîngeha Tehranê di navbera xwendekar û hêzên ewlehiyê de pevçûn û alozî derketine. Tê diyarkirin ku hinek xwendekar birîndar bûne û hinek jî hatine binçavkirin. Hêjayî bibîrxistinê ye ku xwepêşandana xwendekaran ji 7'ê kanûnê ve berdewam dike. Xwendekar bi van xwepêşandanan piştgiriyê didin xwepêşdan û nerazîbûnên karkeran. *TEHRAN*

## Dixwazin di Yekitiya Ewropayê de bimînin

Şîrketa BMG Researchê ji bo rojnameya The Îndependentê anketek amade kir û li gorî encamên anketê, ji sedî 52'yê îngilîzan dixwazin li nava Yekitiya Ewropayê bimînin.

Şîrketa lêkolînê diyar kir ku ji ber hikûmeta Theresa May bi Yekitiya Ewropayê re li ser peymaneke têrker li hev nekir û fikarên li ser bandora giran a derketina ji yekitiyê li ser aboriya welêt, meyla mayîna li nava Yekitiya Ewropayê zêde bûye.

BMG'ê nêrîna 1500 kesî girt û ji sedî 52'yê beşdaran got ku ew dixwazin li nava Yekitiya Ewropayê bimînin, ji sedî 40 jî xwestin, ji nava yekitiyê derkevin. Ji sedî 8'ê beşdaran nêrîna xwe aşkera nekirin.

### Alîgir zêde ne

Di lêkolînên beriya niha de rêjeya alîgirên Yekitiya Ewropayê ji sedî 47-49 bû. Lêkolîna The Îndependentê nîşan da ku hejmara alîgirên Yekitiya Ewropayê cara yekê ye ku zêde bûye.

Beşdaran, performansa Serokwezîr May a di pêvajoya Brexîtê de nirxand. Li gorî encamên lêkolînê, ji sedî 44'ê îngilîzan diyar kirin ku May bi performanseke nebaş rabûye, ji sedî 27 jî gotin, performansek ji vê baştir nedibû.

Rêjeya kesên ku dibêjin; eger plana May ji aliyê parlamentoyê ve neyê qebûlkirin divê îstifa bike jî ji sedî 43 ye. *LONDON*





## Şehba de her ke şona nêweşî zêde bena

**ŞEHBA -** Xebatkara Neweşxaneyê Avrînî ya Kantonê Şehba Roşîn Şêxoye dîyar kerde ke kêmîya îêkanan vera Şehba de bi hezaran merdimî nêeşkenî bêrî tedawîkerdiş û wina va: “Tesîrê negatîf û îmkanê kêmî benî sebebê problemanê muhîmî yê weşî. Şertê zehmetin yê Şehba tesîrêko negatîf weşîya merdiman ser de keno. Seba raşte ra wedarnayîşê probleman, ganî rêxistinê heqê merdiman hetkarî bidî. Sewbîna rejîm seba tedawîya şarê Şehba astengîyan vejeno. Nêweşî her şona zêde bena. Ganî heme kes bi hawayo hessas têbirêrî.”



# Ganî CPT cade bikewo dewre

Avûkatê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî Îbrahîm Bîlmezî tecrîdî rê hêrsê xo ard ziwan û va: “Ganî sere de CPT û sewbîna dezgeyê Ewropa seba Îmrali cade bikewî dewre. Meseleyê kurdî de muxatabê dewleta tirkî Ocalan o. Qerarê MHMEyî sîyasî yo.”

Tecrîdo girankerde ke Raybêrê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî ser o yeno domnayene, dewam keno. Ocalan 15ê sibata 1999î ra nata Girawa Îmralî de binê tecrîdêko giran de yo û 11ê Êlula 2016î de tena pêvînayîşêko kilm viraştbî û o wext ra nata ti xebere tira nîna girewtene. Heme muracatê pêvînayîşî bi mehneyanê ‘Keştîye xirabe ya, rewşa hewayî baş nîya û OHAL’ û cîya cîyayan yenî red kerdene. Avûkatê Ocalanî Îbrahîm Bîlmezî qala Girawa Îmrali, Komîteya Vernîgirewtişê Muameleyo Xirab û Îşkenceyî ya Ewropa (CPT) û Mehkemeya Heqanê Merdiman ya Ewropa (MHME) kerd.

Bîlmezî qiseykerdişê xo de bale ant bêhuqûqîyê Îmrali ser û va: “Tecrîdê Îmrali serra 1999î ra nata esto û çend şono xorî beno. Xora no tecrîd pabesteyê kompoloya mîyanneteweyîye yo. No komplo ke şexsê Ocalanî de azadîya kurdan hedef girewtêne ewro zî dewam keno. Hêzanê serdestan waştî ke Ocalanî binate ra wedarî, la hemverê fikir û îdeolojîyê Ocalanî de ê bi xo çîn bîyî.”



**Tirkîye huqûqî ra dûrî kewena**

Bîlmezî dewamê qiseykerdişê xo de vist vîrî ke heme muracatê pêvînayîşê Ocalanî yê înan yenî redkerdene û wina domna: “Heta nika bi behaneyanê cîya cîyayan pêro muracatê ameyî redkerdene. Roja verêne ra nata Îmrali de huqûq çîn o. Tirkîye pede-pede huqûqî ra dûrî kewena.”


**Qerarê MHMEyî sîyasî yo**

Bîlmezî derheqê qerarê Mehkemeya Heqê Merdiman ya Ewropa (MHME) de zî hêrsê xo ard ziwan û va: “Qerarê MHMEyî sîyasî yo û ê bi nê qerarî amacê xo ra dûrî kewtî. Xora pawitişê Birêz Ocalanî nê dezgeyan ra çîn o. Nika rolo pîl ê CPTyî yo. Ganî CPT cade şêro Îmrali û derheqê weşîya Ocalanî de bi raporêk zanayîş bido rayapêroyî. Ganî sere de CPT û sewbîna pêroyê dezgeyê Ewropa cade bikewî dewre.”

**Muxatabê dewleta tirkî Ocalan o**

Bîlmezî qala muhîmîya rolê Ocalanî zî kerd û qiseykerdişê xo wina qedîna: “Ocalan rayberêko bitesîr o û hetkarê aşitîye yo. Meseleyê kurdî de muxatabê dewleta tirkî Ocalan o. Mesajê Ocalanî yê Newrozî hetê bi mîlyonan ra ameyî goşdarîkerdene û seba şaran bîyî umîd. Ocalan pawitişanê xo yê ke şawitî MHMEyî de vano ke ‘Ez seba meseleyê kurdî yena muhakemekerdene û binê tecrîdî de ya. Heta ke meseleyê kurdan hal mebo, meseleyê Rojhelato Mîyanêne zî çareser nêbeno û ez zî azad nêbena.’ Dewlete heta cayêk eşkena mudaxaleyê komelî bikero, la nuqteyêk ra dima şar xo îdare keno.” *AMED*

## Wa Dayîka Sîsê serbest bêra veradayene



Sîsê Bîngola 85 serrî ya ke nizdîyê di serran o zindanê Tarsûsî de yena tepiştene û rixmê heme nêweşîyan û serranê ci nîna tehlîyekerdene. 2ê teşrîna peyêne de rewşa Dayîka Sîsê xidar bîye û Zîndanê Tîpa Tyî yê Tarsûsî ra sewqê Nêweşxaneyê Unîversîteya Mersînî bibî. Sîsê Bîngole 8 rojî nêweşxane de dermankerdişî ra dima reyna erşawîya zîndan. Dayîka Sîsê yew aşmîya ke seba tehlîye rapor pawena.

Avûkata Bîngole Gulşen Ozbeke daye zanayene ke seba muracatê tehlîyekerdişî raporî pawena, la raporo ke ganî 2 hewtayan de bibîyêne hadre yew aşmîya ke hadre nîyo. Hemserekê TUAYDERî Ebedîn Aktaşî vist vîrî ke Bîngole nêweşxane de zî binê şertanê tecrîdî de ameye dermankerdene. Hemserekê Komeleya Heqê Merdiman (ÎHD) ya Mersînî Hakki Demîrî zî zîndan de tepiştişê Bîngole sey binlingkerdişê heqê merdiman name kerd û waşt wa Bîngole cade sebest bêro veradayene. Sîsê Bîngola ke par ra zîndan de ya û bi sucdarîya hetkarîya rêxistinî 4 serrî û 2 aşmî cezaya aye esta. *MERSÎN*

## ‘Tirkîye timî menfîetanê xo dima şona’

Pêrodayîşo ke bi serran o Sûrîye de yeno kerdiş hîna zî dewam keno. Girêdayeyê na rewşe problem û qewimîyayîşê xorî benî sebebê qetilkerdiş û bêasayîşê merdiman. Derheqê babete de Rayîrberîya Kampa Seserre ya Şehba Hêvîn Reşîde qisey kerde û arde ziwan ke hêrişê hemverê şarê kurdî û çaresernêkerdişê problemanê Sûrîye de projeyê Neteweya Demokratîke çareserî yo.

Hêvîne qiseykerdişê xo de dîyar kerde ke seba çinkerdişê şerê Sûrîye seferberîyêko ortax muhîm o û wina domnaye: “Hêzê mîyanneteweyî û dewleta tirkî tena menfîetanê xo fikirîyenî û cok ra hêriş kenî. Dewleta tirkî herra Sûrîye dagir kena û nêwazena şer biqedîyo. Hêrişê hemverê kurdan yenî mehneya bêtehemulîya qezencanê kurdan. Kesêk bi asanî nêeşkeno nê qezencan destê ma ra bigîro. Tirkîye timî menfîetanê xo dima şona.”

**Nêwazenî çareserî pê bêro**

Hêvîne tewr peynî wina va: “Ganî heme dinya seberber biba. Çimkî çareserîya problemê Sûrîye zemînê asayîşê dinya ya. Hewldayîş û fikrê Rayber Apoyî yê seba çareserkerdişê problemanê Sûrîye xeylê muhîm î. Kesê ke nêwazenî çareserî pê bêro, Rayber Apoyî tecrîd kenî.” *ŞEHBA*




## Berlîn û Chur de vîrardişê şehîdan

Paytextê Almanya Berlîn de û bajarê Churî yê Swîsre de bi aktîvetayan şehîdî ameyî vîrardene. Seba îdarekaranê PYDyî Şîlan Kobanê (Meysa Baqî), Zekerîya (Zekerîya Îbrahîm), Fuat (Hikmet Tokmak), Cemîl (Nebo Alî) û Ciwan (Haci Cuma Alî) yê ke 29ê Teşrîna peyêne de Mosil de cuya xo vîndî kerdebî Berlîn de vîrardişêk ameyî vîrardene.

Kîteyêka qerebalixe tewrê vîrardişo ke komela Merkezê Cimatê Kurdan yê Demokratîkî (NAV-DEM) de ame organîzekerdene bîye. Vîrardiş de aktîvîstê ke Berlîn de seba wedartişê tecrîdê serê rayberê şarê Kurdî Abdullah Ocalanî kewtê grevê vêşanîye zî ca girewt. Gerîlayê HPGyî Yusûf Tunç (Azîz Çirav) û Murat Ozdemîro (Şoreş Roza) ke 17ê Teşrîna verêne de bejikê şaristanekê Komurî yê Semsûrî de şehîd kewtîbî şaristanê Churî yê Swîsre de ameyî vîrardene. *CHUR*




## Padayîş texrîbkerdişê demokrasî yo




Hukmatê Herêma Kurdistanî 25ê teşrîna peyêna 2018î de qerar da ke partî û rêxistinê ke yenî îdarekerdiş fermîyetê înan çin î, ganî bêrî padayîş. No qerarî ra dima merkezê Hereketê Azadîye yê Komelê Kurdistanî ame padayîş û destûr nêdîyeno ke ti çalakîyêk pê bêro.

Nuştox û Rojnameger Şiwan Mihemedî dîyar kerd ke padayîşê merkezê Hereketê Azadîye yê Komelê Kurdistanî binpaykerdişê heqê merdiman o û wina va: “Hereketê Azadîye hêzêko çekdar nîyo û hêzêko medenîwaştox o. Qey Iraqî de destûr yeno dayîş, la tîya de destûr nîno dayîş. Padayîşê merkezan texrîbkerdişê demokrasî yo. Hêzê ke Kurdistan de serdest î, hîzbulla û hêzê leşkerî yê huzbulla yî. Dewleta tirkî çiqas hêzê kurdan yê Vakur û yê bînan bêveng bikera zî nêeşkena biresa netîceyêk. Kurd tena kurdê Vakur nîyî. Çar parçeyê Kurdistanî de kurd estî û ganî heminan reyde pê bikera.” *SILÊMANÎ*


## Qeraxê Cudî de rîyêko nimite: **Gelîyê Rû**





Weşîkbîyayîşê xoza yê her çar hetê Kurdistanî bendeyê kişfkerdişî yî. Dormeyê bajarê Şirnexî pêrodayîş û qerarê herêma asayîşê taybet vera ameyo piştiş û heme caya de leşkerî ameyî bicakerdiş. Dewa Xirabreşke ya qeraxê koyê Cudî ya qezaya Silopî ya Şirnexî de gelîyêke bi heybet esta. Şarê dewe nameyê aye ‘Rû’ dayê ci. Gelîye qeraxê Cudî ra dest pêkena û heta dewa Xirabreşke dewam kena. Gelîya ke hetê dewijan ra bi serran ameye xebetnayîş badê serranê 90an tena ameye verdayîş. Gelîye bi dîmenê xo yê weşike her kesî şaş veradana û çirrêk zî mîyanê aye de esta. Hemwelatîyê dewe dîyar kerdî ke ê bi nê seba awe eşkenê şêrî.” *ŞIRNEX*

**ROJA NEWE**



Serhildan ANDAN
laser.zizzz@gmail.com

## Çalakîya wijdanî vila bena!

Wijdan û exlaq seba famkerdişê merdimayîye çiyê en muhîm yan zî esasê en pîl ê. Labelê roja ma ya ewro de modernîteya kapîtalîst kena ke wijdan û exlaqî mîyanê komelan ra dima ra şexsan ra bigîra û dinyayêka bêwijdan û bêexlaq birona.

Vera na kerdena modernîteya kapîtalîst de mucadeleyêko pîl esto û şarî dorê nê mucadeleyî de bîyî yew. No mucadele her çiqas pêrûnê dinya de bibo zî esasê xo de rojhelato mîyanên de dest pêkerd. Kurdî bi rayverîya birêz Abdullah Ocalanî; nika şaran ra rayverîye kenî û vera modernîteya kapîtalîst de komelo biwijdan û biexlaq pawenî.

Birêz Abdullah Ocalanî binê esareto ke hetê dewleta Tirke û hêzanê bînan rê ci rê ameyo ferzkerdene de, bi fikranê xo vernîya şarê kurdî û şaranê bînan akerd. Birêz Ocalanî bi paradîgmaya newî ke şertanê Îmraliyî de aver berd û binê tecrîdêko giran de şaran ra pêşkêş kerd; hetê zaf hetan ra ameye qebûlkerdene.

Ewnîyayîşê birêz Ocalanî bi no qeyde vera modernîteya kapîtalîst de bi hêzo yewin û heme kesan dorûverê xo de ard pêser. Kurdî bi perspektîfo modernîteya demokratîk ke birêz Ocalanî vera kapîtalîzmî de rona dest bi mucadeleyêko newe kerdî; no mucadele sere de dewleta Tirke, gelek hêzanê bînan tersna û tecrîdê Îmraliyî bi no qeyde bi xorîn…

Demêko derg o ke tecrîdê Îmraliyî dewam keno. Her çiqas keye û avukatî seba pêvînayîşî muracatan kenî zî nêeşkenî şêrî Îmrali û her wext hetê îdarekaranê dewlete ra muracatê înan yenî redkerdene. Na rewşe prosesê çareserî ra dima dest pêkerd û hema zî dewam kena.

Îdarekarê dewlete bi no qeyde îradeyê pêrûnê şarê kurdî gêno binê linganê xo. Bi milyonan kurdî birêz Ocalanî sey îradeyê xo vînenî û sey rayver xo rê qebûl kerdî. Vera no îrade de dewlete tu game nêerzena û hurmet nîşanê îradeyê kurdan nêdana. Kerdena dewlete xura teberê hiqûqî de ya. Hem tecrîd hem zî astengkerdişê keye û avukatan tu hiqûqê dewletan de ca nêgênê.

Ewro seba ke na bêhiqûqî orte ra bêra wedarnayîş çalakîyî estî. Demêko derg o ke nê çalakîyî dewam kenî. Labelê çalakîya en peyêne ya ke hema zî dewam kena û vengê aye resaya caz cayanê dinya; çalakîya grevê vêşanî ya Leyla Guvene ya. Hemsereka Kongreya Komelê Demokratîk û Parlamentera HDPyî ya Colemêrgî Leyla Guvene 33 rojî yo seba ke tecrîd bêro wedarnayene çalakîya grevê vêşanî de ya.

Guvene reyde hem teber hem zî zindanan de gelek kesî kewtî grevê vêşanî û çalakîya Guvene pêrûnê dinya de veng dana. Kurdî ewnîyayîşê xo yê wijdanî û exlaqî yê ke Rayverê xo birêz Abdullah Ocalanî ra girewtî; seba Rayverê xo bi o ewnîyayîş çalakîyan de yî. Çalakîya wijdanî û exlaqî nika gelek cayan ra vila bena û kurdî şexsê Leyla Guvene de kenî ke her cayan de beşdarê nê çalakîyan bibî û tecrîdê Îmraliyî perçe bikî.

Çunkî zanî ke heta ke berê Îmraliyî anêbî, înan rê azadî û pêrûnê Kurdistan û Tirkîye ra aşitî nêna. Aye ra wayîrvejîyayîşê nê çalakîyan seba heme kesan zaf muhîm o. Bi nêzdîbîyayîşê wijdanî û exlaqî do tecrîd wedarîyo û hîşyarîyêka pîle bikewa mîyanê şarê kurdî.

www.arsivakurdi.org

# Şewqek li folklorê zêde bû

*Weşanên Wardozê bi navê* **“Seta Folklora Kovaran”** *hemû nivîsên folklorîk ên kovara Hawar, Ronahî û Roja Nûyê tesnîf û çap kirin. Set ji sê pirtûkan pêk tê. Weşanxaneyê bi tesnîfkirina nivîsên folklorîk ên Hawar, Ronahî û Roja Nûyê şewqek li folklorê zêde kir*

**Bîlal GULDEM / AMED – MA**

Weşanxaneya Wardozê ku li Amedê pitûkên kurdî çap dike, xebateke din li wêjeya kurdî zêde kir. Weşanxaneya Wardozê ku tenê xebatên der barê folklora kurdan de çap dike, setek nû ya ji sê pirtûkan pêk tê weşand.

Di van her sê pirtûkan de hemû nivîsên têkildarî folklora kurdan ên di kovara Hawar, Ronahî û Roja Nûyê de hatine tesnîfkirin.

Folklora Hawarê ji aliyê Mehpûs Serhedî, folklora Ronahiyê ji aliyê Mem Mukriyanî û folklora Roja Nûyê jî ji aliyê Rênas Xendekî ve hatine tesnîfkirin.

**Kovara Hawarê**

Di pirtûka “Kovara Hawarê” de hemû nivîsên folklorîk ên mîna “çîrok, fabl, xeberoşk, destan, efsane, kilam, stran, lorî, lavij, gotinên pêşiyan û tiştanok û hin nivîsên li ser eşîr û erdnîgariyê hatine tesnîfkirin.

**Kovara Ronahiyê**

Di pirtûka “Kovara Ronahiyê” de hemû nivîsên wek “çîrok, fabl, xeberoşk, destan, pêkenok û nivîsên li ser eşîr, bawerî, nêçîr û salnameya kurmancî hatine tesnîfkirin.

**Kovara Roja Nûyê**

Di pirtûka “Kovara Roja Nûyê” de jî hemû nivîsên folklorîk ên mîna “Çîrok, fabl, kilam, stran, payîzok, lorî, destan, dûrik, qewl, hin gotinên pêşiyan û mamik hatine tesnîfkirin. Her wiha di dawiya her sê pirtûkan de jî ji bo têgihîştina deqên folklorîk ferhenga folklorê jî li dawiya wan hatiye zêdekirin.

Edîtor û xwediyê Weşanên Wardozê Bahoz Baran der barê xebata her sê pirtûkan de axivî. Baran da zanîn ku dema ew dibêjin Weşanxaneya Wardozê ewil folklor tê bîra mirovan û got: “Folklor tiştekî zindî ye. Folklora di roja me ye îro de û folklora zemanê berê hatiye qeydkirin û hatiye nivîsîn jî heye. Em tiştên di roja me de hene berhev dikin. Xwe digihînin berhemên xwe yên dîrokî yên folklorîk. Çimkî ew nivîsên folklorîk di nava tekstan de fetisîne. Lazim e ji bo mirov tiştekî ji wan tekstan fêhm bike bên derxistin û xwendin.”

Baran destnîşan kir ku Celadet Elî Bedîrxan, Kamûran Elî Bedîrxan ango malbata Bedîrxaniyan gelek qîmet daye ziman û wêjeyê û got: “Me di nava xebatên wan de ronahiya folklorê jî dît. Gelek xebatên folklorê di nava xebatên wan de hene û her yek li cihekî belav bûye. Me xwest wan nivîsên folklorîk bînin ber hev û tesnîf bikin. Em fêhm bikin ka di Kovara Hawarê, Ronahiyê û Roja Nûyê de li ser navê folklorê çi hatiye kirin. Me bi vê boneyê berê xwe da her sê xebatan. Ji çîrokan bigire heta xeberoşk, destan, kilam, ayîn, gotinên pêşiyan û gelek nivîsên cur bi cur ên folklorîk hatine bicihkirin. Herwiha hevalên me li ser vê xebatê sekinîn û yek bi yek nivîs tesnîfkirin.”

Baran behsa her sê xebatên tesnîf kirine kir û wiha domand: “Derdê me jî yek jê ew e, em dixwazin nivîsên folklorîk ên wê çaxê bi rastnivîsa roja me bi rehetî bên xwendin. Ango bila mirov tê de asê nemînin û bikaribin bixwînin da ku tiştekî jê fêhm bikin. Rastnivîsa her sê pirtûkan me li gorî roja me çêkir. Lê me guhertinek di peyvê wan de çênekir. Xebatên folklorîk çawa hatibe gotin, divê wisa bê nivîsîn. Mirov nikare dest bidê û ew qaydê ewil a folklorê ye. Mebesta me ew bû ku mirov bizanibin xebatek di wan kovaran de hatiye kirin. Lê ne li ber çavan e. Me niha ronahiyek û şewqek da ser folklora Hawar, Ronahî û Roja Nûyê.”

### Yek bi yek nivîsandin

Baran diyar kir ku wan navê “Seta Folklora Kovaran” li xebata xwe kiriye û got: “Em dikarin bêjin salek bû em li ser vê projeya hanê dixebitîn. Me nexwest em wan kovaran kopî bikin. Me yek bi yek nivîsand. Hevalên me wextek zêde dan nivîsandinê. Beriya niha jî Kovara Hawar û Ronahiyê hatibû çapkirin, lê heta niha tu kesî Roja Nûyê çap nekiriye. Roja Nûyê wek kovarek winda jî xuya dikir. Me di dawiya her pirtûkê de jî bo fêhmkirina peyvên folklorîk jî beşa ferhengê nivîsandiye.”




# ‘Resmê mezin îlluzyon e’

**Ronî ARAM / STENBOL - ANF**

Şaxa Rêxistina Efûyê ya Navnetewî ya Tirkiyeyê ji ber salvegera 70’emîn a Danezana Mafên Mirovan a Gerdûnî li DEPO Stenbolê pêşangehek bi navê ‘‘Resmê Mezin” vekir. Pêşangeh dê heta 30’yê kanûnê de dê vekirî be binpêkirina mafê mirovan daye ber xwe.

Pêşangeha ku li ser têgîna ‘resmê mezin’ hatiye danîn, a rast bi pozîsyoneke wiha ye ku vê pênaseyê rexne dike. Ev xebat dibêje, resmê mezin tenê îlluzyonek e ku ji hêla otorîte û desthilatan ve hatiye avakirin û li navenda wê jî parêzvanên mafê mirovan datîne. Tê gotin li dijî şêlûtiya ku vê îlluzyonê ava kirî bibîranîn, ji bo geşkirina hêviyê bi hevrebûyin, hilberandin bersiva herî mezin e li dijî vî resmê mezin.

**Tabloya Zehra Dogan**

Xebata bi navê “Cenaze” ya nûçegihan û şêwekar Zehra Dogan jî li vê pêşangehê heye ku Zehra Dogan nûçegihanê JINHA’yê bû, ku JINHA bi KHK’ê hatibû girtin. Tabloya Dogan a beriya ku were girtin, 2016’an hatibû çêkirin û dema dorpêçên bajaran temsîl dike.

Li gel xebata Dogan gelek xebatên din hene ku binpêkirina mafên mirovan kirine mijara xwe. Xebateke bi navê ‘ÎSTÎKRAR’ ya Arzû Yayintaş û Nerîman Polat jî heye, ku 2016’an bi 3322 bizmaran peyva ‘ÎSTÎKRAR’ nivîsîbûn, ku her yek ji van bizmaran temsîla sivîl, leşkeran dike, ku dema dorpêçan mirine û temsîla wan kesên ku li ser kar mirine û li ber avên Tirkiyeyê fetisîne. Hunermend peyva ‘îstikrar’ê ku desthilat pir bi kar tînin, bi mirinê re dikin yek û wiha didin. Navê hunermendên ku xebatên wan li pêşangehê têne nîşandan: Arzu Yayintaş, Asli Alpar, Başak Bugay, Bengu Karaduman, Berrîn Simavlioglu, Candaş Şişman, Cansu Gursu, Çagrı Saray, Ethem Onur Bîlgîç, Fatoş Îrwen, Gumuş Ozdeş, Hakan Gursoytrak, Halîl Yavuz Erturk, Kemal Gokhan Gurses, Lamîa Karaalî, Memet Gureli, Murat Başol, Nalan Yirtmaç, Nermîn Er, Neriman Polat, Nazim Dîkbaş, Sevil Tunaboylu, Oguz Demir, Tan Cemal Genç, Zehra Dogan, ZULAL.







## Tabloya Sûriyeya demokratîk

Wênesaz û peykertiraşê ji pêkhateya ereb, Cemal Ebidselam Mihemed (41) ji bajarê Reqqayê ye. Ebidselam ji 8 saliya xwe ve dest bi karê wênexêziyê kiriye. Cemal Mihemed dibêje yê ji bo pêşketina wî ew teşfîk kiriye mamosteyê wî bûye. Bi mamosteyên wekî Heyka Eymen Nasir û Mihemed Ayaş re kar kiriye û beriya DAIŞ bikeve Reqqayê, bi hev re pêşangehek li ser kevneşopên Reqqayê li dar xistine.

Cemal Ebidselam Mihemed piştî dagirkirina Reqqayê ji aliyê çeteyên Cebhet El Nusra ve bi du salan ji bajarê xwe derket û derbasî Girê Spî bû. Jiyana hevpar a gelan a li Girê Spî bala Cemal dikişîne û li ser pevrejiyana gelan tabloya nexşeya Sûriyeyê çêkir. Piştî tabloyê, peykerê jina azad, peykerê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û hinek tabloyên din jî çêkirin. Cemal Mihemed hestên xwe yên dema derbasî Girê Spî bû, wiha anî ziman: “Piştî ku min zilma li Reqqayê dît û ez hatim Girê Spî, min dît ku çawa hemû pêkhate bi yek ruhî li gel hev dijîn, ez matmayî mam. Her kesî bi hev re bajarê xwe diparast. Min wê demê fêhm kir şoreşa rast a Rojava ye. Vê pevrejiyanê bala min kişand û min tabloyek çêkir.” *GIRÊ SPÎ*



# Dengbêj ji bo **Nesrîn Şêrwan**ê distrên

Chalak Events, par meha îlonê ji aliyê 5 xwendekarên zanîngehên Stenbolê wek platformeke çandî û hunerî li Stenbolê hatibû avakirin. Heta niha gelek çalakiyên cur bi cur li dar xistine.

Niha jî Chalak Events wê du şevbêrkên dengbêjan li dar bixe. Dê di 22-23’yê kanûnê de li Stenbolê ji bo bîranîna Nesrîn Şêrwan du şevbêrk bên çêkirin. Mêvanên şevê, Cemalê Mihê, Dengbêj Kurdê, Avdilayê Goyî û Henîfa Şirnexî ne.


Dengbêjên tev li şevbêrkê bibin dê kilam, payîzok, heyranok û lawijên herêma Botanê bibêjin. Wê şevbêrka ewil di 22’yê kanûnê de li Şa Performansê be û wê ya duyan jî di 23’yê kanûnê de li Şevîn Teras Cafeyê be.

Chalak Event derheqê şevbêrkan de wiha got: “Di van şevan de kilam, payîzok, heyranok û lawij ên Botanê dê ji aliyê her çar dengbêjên Botanê ve werin gotin. Ev şev wê ji bo bîranîna dengbêj Nesrîn Şêrwanê bê li dar xistin. Em ê bi hev re guhdariya awaz û dengên çiyayî bikin, dengbêjên me wê bi dengekî berz û zelal bistrînin. Bûyerên ku di dîrokê de qewimîn dê nûjen bikin û li me nifşên nû bidin nasandin.”

Herçî bixwaze beşdarî wan şevbêrkan bibe, dikare bilêtên xwe ji Şevîn Teras Cafeyê û di şeva çalakiyê de li ber derî ji Chalak Eventsê bixwaze. *STENBOL*

### NESRÎN ŞÊRWAN KÎ YE?

Dengbêj û stranbêj Nesrîn Şêrwan, di sala 1929’an de li gundekî Şirnexê hatiye dinyayê. Li Radyoya Bexdayê xebitiye û nêzî 500 stranan berhev kiriye. Wê gelek hunermendên hevçaxa xwe yên wekî Mihemed Arifê Cizîrî, Îsa Berwarî, Hesen Zîrek, Tahir Tewfîq, Resûl Gerdî, Şemal Saîb, Kawês Axa nas kirine û stranan li gel wan gotine.




www.arsivakurd.org